Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1171 | 22-Gulan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

## ‘Em bi govend, cil û bergên xwe yên Kurdî bersiv didin êrîşên qirkirinê’



Navenda Nûçeyan

**Mamoste û şagirtên Koma Şehîd Şîlan a Çand û Hunerê ya Baqî Xido a govendê diyar kirin ku ew bi rêya govendê kevneşopiya xwe diparêzin û gotin, “Em bi govend, cil û bergên xwe yên Kurdî bersivê didin êrîşên qirkirinê.”**

Govend tê wateya hunera jiyanî bi awayekî teqlîd bê nîşandan. Her wiha govend wek beşeke şano (şanoya bêdeng) jî tê pênasekirin. Govend di encamê şopandina bûyerên jiyanê yên rojane û ew bûyer bi rêya govendê tên nîşandan. Govend jî ji 3, 4 heta 5 kesan û şûnda tê lîstin.

Yek ji çandên sereke û xwedî taybetmendiyeke cuda di nava netewa Kurd de lîstina govendê ye. Ew govend jî weke çîrokekî ji nifşekî vedughere nifşekî din. Govend jî xwedî çîrok û serpêhatiyên cuda cuda ye ku têda bûyerên hatine qewmandin bi rêya govendê tê diyarkirin, ew bi xwe zimaneke û têde peyamek tê dayîn.

Ji destpêkirina şoreşa Rojava û vir ve xebatên govendê ya di dema rejîmê de ku bi awayekî veşartî dihatin kirin veguherî xebateke berbiçav û cihê xwe jî di bin sîwana TEV Çand û li navenda çand û huner a Baqî Xido cihê xwe girt in. Yekemîn koma ku li Kobanê piştî şoreşê ava bû, ew jî Koma Şehîd Şîlan e. Ev kom bi dîlanên cuda yên herêmên Kurdistanê li ser dikê ji gel re bi çîrokên cuda têne pêşkêş kirin.

Koma şehîd Şîlan Kobanê yek ji komên ku di her şahiyê de cihê xwe digrin û bi dîlanên xwe kêfxweşî û hezkirinê dikin dilê gel. Koma Şehîd Şîlan jî yek ji komên ku piştî koma Şehîd Sînan û beşekî ji wê komê ye, hatiye avakirin. Têkildarî Koma Şehîd Şîlan şagirt û mamosteyan nêrînên xwe anîn ser ziman.

Mamosteyê Koma Şehîd Şîlan Mihê Izedîn, li ser girîngiya xebatên govendê wiha dibêje, “Bi destpêkirina şoreşa Rojava re gelek kom hatin avakirin. Ev kom jî ji wê rojê heta niha rêwîtiya xwe didomînin. Gelek govendên herêma Kurdistanê em dilîzin, bêhtirî wê jî ya filiklora Kobanê ye. Govenda Amed, Riha û Dîlokê jî em dilîzin. Bi van govenda jî em kevneşopiya xwe diparêzin. Dagirkerî her dixwaze ew kevneşopiya me û çanda me qir bike. Bi van govendan jî em kevneşopiya xwe diparêzin. Em jî bi govend, cil û bergên xwe yê Kurdî bersivê didin êrîşên qirkirinê.”

Şagirta govendê ya bi navê Sîbel Mehmûd jî anî ziman ku ew bi lîstina govendê xwe gelek bextewar hîs dike û wiha axivî, “Ez hîs dikim ku difirim. Ev pênc sal in ez li navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido cihê xwe digirim. Niha di koma şehîd Şîlan de cihê xwe digirim û govendê digrim. Em govendên xwe digerînin û di nava hefteyê de du rojan em têne perwerdekirin da ku em di şahiyan de govenda xwe bilîzin. Govendê me jî ji herêma Kurdistanê ye û em her carê çîrokek bi rêya govendê ji temaşevanan re pêşkêş dikin. Ji govendê hez dikim û dema derdikevim ser dikê gelek bi kelecanî dibim.”

Şagirtê bi navê Baran Silêman, jî ku yek ji şagirtên Koma Şehîd Şîlane, da zanîn ku ew bi filiklor, cil û bergên xwe yê Kurdî dîlanê dilîzin û wiha got, “Em bi dîlanên herêma xwe derdikevin ser dikê. Her car kelecaneke cuda em dijîn. Di dîlanê de em cihê xwe di her şahiyê de digrin, ew jî ji bo me kêfxweşiyeke nayê pênasekirin. Hezkirina me ya ji govendê re jî wiha ye.”

## Bandora Edebiyata Kurdî ya Nûjen

Navenda Nûçeyan



**Edebiyata kurdî ya nûjen, beşeke wêjeya kurdî ye ku ji nîveka sedsala 20an heta îro pêşketiye û cihêreng bûye. Di vê serdemê de nivîskar û helbestvanên kurd bi bikaranîna teknîkên edebî yên nûjen û bikaranîna ziman dest bi berhemdayîna berhemên edebî kirin. Edebiyata kurdî ya nûjen bi guherînên civakî û bûyerên siyasî pêş ket û li ser mijarên cihê rawestiye.**

**Çend taybetmendiyên girîng ên edebiyata kurdî ya nûjen ev in:**

1. Ziman û Pergala Nivîsandinê: Edebiyata Kurdî ya nûjen berhemên ku bi zarava û şaxên zimanê Kurdî yên cuda hatine çêkirin dihewîne. Her wiha zaravayên kurdî yên wek Kurmancî, Zazakî û Soranî ku bi alfabeya latînî hatine nivîsandin cihekî girîng digirin. Ev cihêrengiya zimanî, dewlemendî û cihêrengiya wêjeya kurdî radixe ber çavan.
2. Nasname û Pirsgirêkên Civakî: Wêjeya Kurdî ya nûjen li ser nasnameya Kurdî, hişmendiya etnîkî û pirsgirêkên civakî disekine. Di van berhemên edebî de gelek caran behsa zehmetiyên kurdan, pêvajoyên siyasî û guhertinên civakî tê kirin.
3. Koçberî û sirgûnî: Ji ber nakokiyên siyasî û sedemên aborî gelek kurd ji gundên xwe koçî bajaran an jî welatên cihê bûne. Edebiyata kurdî ya nûjen van serpêhatiyan bi destxistina mijarên koçberî û sirgûnê nîşan dide.
4. Pirsgirêkên Jin û Zayenda Civakî: Di wêjeya Kurdî ya nûjen de zehmetiyên ku jin dijîn û pirsgirêkên bi nasnameya jinê re jî cihekî girîng digirin. Berhemên nivîskar û helbestvanên jin serpêhatî û têkoşîna jinan a di jiyana rojane de nîşan dide.
5. Cûreyên Wêjeyî: Edebiyata Kurdî ya nûjen cureyên wêjeyî yên curbicur wek helbest, roman, çîrok, şano, gotar di xwe de dihewîne. Di berhemên vê cureyê de teknîkên edebî û şêwazên vegotinê yên hevdem tên bikaranîn.

Edebiyata kurdî ya nûjen di xurtkirina nasnameya çandî, parastina ziman û vegotina serpêhatiyên kurdî de roleke girîng lîstiye.Di heman demê de, nivîskar û helbestvanên kurd bi berhemên ku di qada navneteweyî de jî tên naskirin, wêjeya kurdî bi xwendevanên berfireh dan naskirin.

Sudoku: Bersiv 83

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 5 | 3 | 9 | 8 | 1 | 6 | 2 | 7 |
| 8 | 7 | 1 | 2 | 6 | 4 | 5 | 9 | 3 |
| 9 | 2 | 6 | 5 | 7 | 3 | 1 | 4 | 8 |
| 2 | 3 | 8 | 6 | 1 | 5 | 9 | 7 | 4 |
| 1 | 9 | 7 | 8 | 4 | 2 | 3 | 5 | 6 |
| 6 | 4 | 5 | 3 | 9 | 7 | 8 | 1 | 2 |
| 3 | 6 | 2 | 4 | 5 | 9 | 7 | 8 | 1 |
| 5 | 1 | 4 | 7 | 3 | 8 | 2 | 6 | 9 |
| 7 | 8 | 9 | 1 | 2 | 6 | 4 | 3 | 5 |

Sudoku:Pirs 84

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | | | 3 | 7 | | | 1 | |
| | | | | 4 | | | | 5 |
| 3 | | 4 | 9 | | | | 2 | |
| | 4 | 1 | | | 6 | | 7 | |
| | | | 2 | | 4 | | | |
| | 3 | | 8 | | | 2 | 4 | |
| | 7 | | | | 9 | 5 | | 3 |
| 8 | | | | 6 | | | | |
| | 9 | | | 8 | 3 | | | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Desmala li ser destan e:**
- Pir jê tê heskirin; her kes jê hes dike.

**Destê min jê nabe:**
- Ez naxwazim jê dûr bikevim; ez pir jê hes dikim.

**Destê min jê naqete:**
- Bi heman wateyê.

**Dil bi dil dizane:**
- Ez ji te hes dikim ji ber wê tu jî ji min hes dikî

**Dil mûqabilê dil e:**
- Bi heman wateyê.

**Dil berdayiyê:**
- Jê hes dike; ji xwe re dixwaze. (Ji bo tiştên bedew tê gotin, lê bi giranî ji bo dildariyê tê gotin)

**Dilekî na bi heft dilan:**
- Pir.

**Di dilê min de ye:**
- Pir jê hes dikim.

**Dilê min li dûv ma:**
- Pir xweşik bû; hêja bû; min dixwest ji xwe re bînim.

**Em ne ji malekî ne, lê li halekî ne:**
- Em ne xizmên hev in, lê em ji hev re weke bira ne.

**Gêsinekî haletekî biavêjin ber lingê wî:**
- Dema mirovek demeke dirêj neçûbe cem mirovek, yan dostekî xwe, dema diçe wisa jê re dibêjin. Bi wî awayî, hem gazindan jê dikin, hem keyfxweşiya xwe tînin ziman.

**Her tişt xist devê wî:**
- Her tişt dayê.

**Jê re bûye kurm:**
- Jê re bûye girr; jê re bûye nexweşî; jê re bûye adet; nikare dev jê berde.

**Kurmikê civatê ye:**
- Bê civat tebata wî nayê; civat jê re bûye weke kurm.

**Li ser destan digirin:**
- Pir qîmet didinê; pir jê hes dikin.

**Mala min tewleya hespê te ye:**
- Mala min di xizmeta te de ye; ezê bi mêvandariya te pir bextewer bibim.

**Nade bi bav û bira:**
- Ji bavê xwe pirtir jê hes dike; pir jê hes dike.

**Pêlava te li ser serê me ye:**
- Em ji gotina te dernakevin; qîmetê te li cem me pirr e.

**Qûna xerîban bihingiv e:**
- Tiştên, yan jî kesên xerîb ji yên nas şîrîntir in.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Fikir û felsefeya Rêber Apo ji tevahiya pirsgirêkan re çareserî ye’



Endamê Yekîtiya Rewşenbîran a kantona Cizîrê Cemal Çaçan diyar kir ku ew ê vê berxwedanê li tevahî cîhanê zêdetir berfireh bikin û ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo çi pêwîst be ew ê bikin û got, “Îro felsefeya Rêber Apo li hemû cîhanê belav bûye û ji bo tevahiya pirsgirêkan çareseriye.”**R-4**

## Kovara Afaq Almeraa pênûsa asoyên jinê ye



Edîtora Kovara Afaq Almeraa Nêrgiz Ismayîl diyar kir ku armanca Kovara Afaq Almeraa ew e ku jin dîrok û zanista xwe nas bike, herwiha di ramana xwe de azad be.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1171 | 22-Gulan-2024 | www.ronahi.net/ku/

# RÛYÊ REŞ YÊ FAŞÎZMA AKP-MHP’Ê ‘DOZA KOBANÊ’

‘Doza Kobanê’ parçeyek ji polîtîkayên qirkirina Kurdan e û bi armanca tasfiyekirina siyaseta demokratîk hatibû vekirin, cezayên giran li dehan rêveber, endam û siyasetmedarên HDP’ê birîn. Ev doza ku diyardeya herî zelal a zihniyeta dij-kurd e, tu têkilya wê bi hiqûqê re nîne û ji aliyê desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê ve hatiye pêşxistin e. Doza Kûmpasê ya Kobanê bi temamî dozeke siyasî û qirkirinê ye û dadgeha ku ev biryar daye jî dadgeha qirkirinê ye. Li hemberî wê jî û ji bo têkbirina faşîzma AKP-MHP’ê têkoşîneke demokrasî ya hevpar pêwîste.**R-3**



## ‘Bikaranîna çekên kîmyawî nîşana bêhêzbûna dagirkeriya Tirk e’



Lêkolîner Lezgîn Ibrahîm da zanîn ku bikaranîna dewleta Tirk ji çekên kîmyawî li hemberî Gerîlayên Azadiyê ji ber bêhêzbûna wê ye û got, “Dewleta Tirk a dagirker di şerê li dijî Gerîlayên Azadiyê de PDK’ê wekî amûrekî bikar tîne.”**R-5**



## Zextên faşîzma Tirk li Ser Rojnamegeriya Azad berdewam e

Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê zext û zordarîyên ser rojnamevanan her roj zidetir dibe.Li dijî wan binçavkirin, işkencekirin û kuştin dewam dike. Armanca desthilatdariya faşîst a Tirkiyê ji van kiryaran bêdengiya dengê rojnemevanên azad e.**R-4**



## Zimanê dayîkê dide jiyankirin

Mamosteyê zimanê Kurdî Aras Ehmed bi rêya vîdeoyan li gel şagirtên xwe, zimanê kurdî dide hîskirin û vîdeoyên wî bi rêjeyek mezin tên temaşekirin û hezkirin.**R-7**

Nehîr pale
AKP`ê dijminê jinê ye R-2


Dilyar Cizîrî
Serxistina hilbijartinên şaredariyan riya çareseriyê ye R-4


Farûk Sakik
‘Doza’ tolgirtina berxwedana Kobanê R-5

Zekî Bedran
Nermbûn tune ye, şer didome R-5


Kemal Necim
Ji helbestê fedî nakin bila ji zimanê dayika xwe fedî bikin R-7

# Kovara Afaq Almeraa pênûsa asoyên jinê ye

Edîtora Kovara Afaq Almeraa Nêrgiz Ismayîl diyar kir ku armanca Kovara Afaq Almeraa ew e ku jin dîrok û zanista xwe nas bike, herwiha di ramana xwe de azad be.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi pênûs û fikra azad karîbûn bighêjin tevahî jinên cîhanê û dîrokek azad binvîsînin. Kovara Afaq Almeraa di 20`ê meha Gulana 2023`an de hate avakirin, herwiha karîbû di salekê de mijarên bi wate û giring bixe nava rûpelên xwe, ev yek jî bi riya pênûsa tevahiya jinên berxwedêr, têkoşer, nivîskar û rewşenbîr pêk hat. Bi riya vê kovarê heta astekê pênûsa jinê karîbû hişmendiyên şaş bighurîne û dîrokeke tijî firk û raman ji bo tevahî jinan çêbike.

Derbarê salvegera damezirandina kovarê edîtora Kovara Afaq Almeraa Nêrgiz Ismayîl ji rojnameya me re axivî.



### Pêwistiya tevlîbûna jinê di qada raghandinê de




Nêrgiz Ismayîl di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Li vê erdnîgariya ku em tê de dijîn şoreşek dîrokî ku bi navê jinê hate nasîn û deng veda li dar ket, tê de gelek têkoşîn û kedeke mezin ji bo kurd û Kurdistanê hate kirin, şoreşa ku bi demokrasiyê hate nasîn ji bo avakirina civakek demokratîk û azadiya jinê, di vê şoreşê de jinê karîbû beşdarî qadên leşkerî, siyasî, civakî, rewşenbîrî û hwd.. bibe, herwiha karîbû bighêje asteke mezin ji fikra demokratîk û bi îradeyeke azad civakeke demokratîk hate avakirin.”

Nêrgiz Ismayîl wiha domand: “Şoreşa 19`ê Tîrmehê bû mîrateyek ji bo têkoşîna jinê, di nava şert û mercên zehmet de tevlî qada raghandinê bû û bi beşdarbûna wê bû alîkar da ku ev qad bipêşbikeve, li seranserî Sûriyê şoreşeke li dijî zilmê û desthilatdariyê hate li darxistin. Tevahî pêkhateyên Sûriyê tevlî vê şoreşê bûn. Di nav de gelê kurd jî ku xwedî dîrokeke têkoşîn û azadiyê bû, vê şoreşê geleke pêşketin bi xwe re anî, şoreşek bi wate di nava xwe de şoreşa jinê li dar ket. Ji 2011`an ve û heta niha gelek şer û komkujî li vê deverê qewimî û qurbaniyê vî şerî jî jin û zarok bûn.”

Nêrgiz Ismayîl wiha pê de çû: “Qada çapemeniyê di nava şert û mercên zehmet de xwe ava kir, piştî ku gelek gav hate avêtin û jin beşdarî gelek qadên qehremantiyê û berxwedaniyê bû, pêwîstî hebû ku bi pênûsa jinê û bi asoyên jinê em bikaribin zanista jinê û lêgerînên wê yên azadiyê di riya kovarekê bînin ziman ji bo tevahî jinên Rojhilata Navîn û jinên cîhanê.

### Projeya avakirina kovara Afaq Almeraa

Nêrgiz Ismayîl behsa naveroka kovarê kir û wiha berdewam kir: “Di sala 2023`an projeya avakirina vê kovarê hate destpêkirin bi navê ( Afaq Almeraa) bi drûşmeya Jin, Jiyan, Azadî, hate erê kirin ku her du mehan bê derxistin bi zimanê erebî, ji 132 rûpelan pêk tê her hejmarek mijarek tê hilbijartin li ser wê mijarê çîrok, gotar û şîrove tên nivîsandin.”

### Quncikên kovarê

Mijarên ku di kovara Afaq Almeraa de hatine pêşkêşkirin wiha ne:

-Afaq Hura( Asoyên Azad) Abdullah Ocalan.

-Melef Eleded( Dosyên Hejmarê).

-Afaq Fikriye( Asoya Ramanî).

-Hîwar Eleded( hevpeyvîna Hejmarê).

-Ruiya Siyasiye( Dîtinên Siyasî).




-Xalîdat( Quncika Şehîdên Jin).

-Seda Ruh( Quncika Çîrokan).

-Hemesat Şiriye( Quncika Helbestan).

-Waha Feniyê( Quncika Şêwekarên Jin).

Di dema niha de hejmara kovarê gihaştiye ya 7`emîn, mijara wê jî ( Tevgerên Jinan).

### Kovarên jin yên ku hatin weşandin

Li bajrê Qamişlo kovara ( Asoya Jin) bi zimanê kurdî hate dameziarndin, cara yekem di 24`ê Gulanê sala 2015`an hate çap kirin li ser asta Rojavayê Kurdistanê, ji 80`ê rûpelan pêk dihat lê bi sedema şert û mercên zehmet herwiha êrîşên çeteyên DAIŞ û rewşa şer gihaşt hejmara 16`an û di sala 2016`an hate rawestandin.”

Kovara Sewit Alheyat jî hebû ev kovar dîrokek wê hebû di sala 1999`an hate avakirin, bi zimanê erebî dihat derxistin û çapkirina wê li Lubnan û Helebê bû, gihaşt hejmara 29`an de hate rawestandin bi kovara ( Asoya Jinê ) re, formatê wê hat guhertin û bû kovara Sewit Alheyat.

### Armancên avakirina Kovarê

Nêrgiz Ismayîl wiha domand: “Armanca kovara Afaq Almeraa ew e ku jin dîrok û zanista xwe nas bike, di heman demê de jî di mêjiyê xwe de azad be û karibe civakê bi rêve bibe ji ber ku di dema me ya heyî de roleke pir mezin ketiye ser milê jinê. Armanca me ya din jî ku mêr karibe xwe xwe bighurîne hişmendiya kevin û ya baviksalarî paş guh bike, ji ber ku pirsgirêka avakirina civakek azad, demokrat û jiyankirina jiyaneke azad ne tenê ya jinê ye, em dixwazin di riya nivîsên jinê, rengîniya rûpel û quncikan asoyên jinê û fikrandinên wê bi pênûsa xwe binivîsîne û em bikaribin van nivîsan parve bikin û civakek azad ava bikin.”

### Bandora kovarê

Nêrgiz Ismayîl wiha domand: “Em hewil didin ku bandora kovara me li ser civakê çêbibe, em bighêjin tevahî jinan li seranserî cîhanê, li Ewropayê di ekadîmiyan de mijarên kovara me dibin perwerde û jêder, kovara me li tevahî Sûriyeyê tê belav kirin ji bilî herêmên hundirîn bi awayê pdf tê şandin di heman demê de jî ji jinên rewşenbîr ên Lubnan, Kiwêt, Cezayir, Tunis, Urdin û Misirê tê şandin. Asta jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pir bipêşket û bûne nimûne ji tevahî jinên cîhanê, pênûsa jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li ser rûpelên kovara Afaq Almeraa ew şens dide gelek jinan ku careke din li xwe vegerin, xwezaya jinê û zanista wê bixin nîqaşê, asta xwendina kovarê tê diyar kirin dema ku kovar derdikeve gelek kes bi me re danûstendinê dikin û li ser mijaran nîqaş dikin ev yek rol dide me ku em zêdetir pêşketinan pêk bînin û berdewam bikin.”

Mijarên hejmarên Kovarê yên di salekê hatin çap kirin wiha ne:

-Hejmara yekem ( Jin, Jiyan, Azadî).

-Duyemîn ( Malbata Demokratîk).

-Sêyemîn( zayendperestî).

-Çaremîn( Bîrdoziya Rizgariya Jinê).

-Pêncemîn( Netewa Demoratîk).

-Şeşemîn( Hejmara taybet panorama xebatên Jin a sala 2023`an ber bi serkeftinê sala 2024`an).

-Heftemîn ( Tevgerênên jinan).

Edîtora kovara Afaq Almeraa Nêrgiz Ismayîl axaftina xwe de wiha qedand: “Em xwedî felsefeya Jin, Jiyan Azadî pêwêste em zanista jinê pênase bikin ji bo ku jin azad bibe û civakê azad bike. Em hewil bidin ku kovara Afaq Almeraa bibe deriyek ku hişmendiya desthilatadî û baviksalariyê tune bike û bighurîne.”

## Ji Pênûsa Jin

### AKP`ê dijminê jinê ye

**Nehîr Pale**

Dewleta Tirk a dagirker ji bo li pêşiya têkoşîna jinên siyasetmedar bibe asteng, wê riyên herî gemar û qirêj bide bi kar anîn. Pirsgirêka AKP/MHP`ê bi jinê re îdeolojîke û vekirî dijminahiya jinên Kurd ên siyasetmedar û têkoşînvan dikin. Di hemû bûyerên ku diqewimin de tê fêmkirin ku AKP`ê li hemberî jina têkoşînvan eniya şer vekiriye. Mîtên Tirkiyê li tevayî gund û bajarên Bakurê Kurdistanê quncik bi quncik xwe birêxistin kirine û destê xwe tavjêjin hemû nirxên manewî û madî yên civaka Kurd. Bi taybet şerekî taybet ê giran li ser jinê didin meşandin. Li Bakurê Kurdistanê û herêmên dagirkirî, bi taybet Efrîn li hemberî jinê netewperestî, olperestî û cinsiyetparêziyeke ku hedefa wê qirkirine tê meşandin.

Eger jinan fêzîkî nekujin wê wan birizînin. Ji xwe rizandin rêbazê herî zêde ye ku dewlet li hemberî gelan dide bikar anîn, ew jî bi rizandinê re wê hêdî-hêdî jinê qir bikin.

Li ser asta cîhanî û ev bûye bi sedsalan jin mafên xwe yên jiyanê dixwazin, bila êdî weke mirov li jinê binêrin û rêz bidin wê. Êdî jin jî bibe ciyê biryarê, hebûna xwe biparêze û çarenûsa xwe diyar bike. Berevajî vê yekê roj derbas nabin ku jin neyên kuştin, tecawiz kirin û tûndî li ser wan neyê kirin. Ev yek nayê lêpirsîn kirin an jî hesab ji kesî nayê xwestin. Çi bi serê jinê were kirin wê ne xema kesî be, ya êşa vê yekê dikşînê dîsa jin e. Li tevayî dewletên Rojhilata Navîn êrîşa li ser jinê tê kirin siyasî û îdeolojîke û bi destê dewletan bi xwe tê kirin. Dewlet kengî bibîne jin têkoşîna azadiya xwe dike wê qeyd û zincîran lê bişdîne. Yek ji dewletên ku herî zêde jin lê têne kuştin û tûndî li ser wan tê kirin, dewleta Tirk e. Li Tirkiyê bi sedan jin niha di girtîgehan de ne û hukmê heyanî mirinê di girtîgehê de bimînin li wan hatiye birîn. Ew jî wê çima wan di girtîgehan de birizînin û tu carî nayên efû kirin? Ji ber ku siyasetê dikin. Herî dawî di doza Kobanê de Tirkiyê biryara qirkirina jinê ragihand. Di doza Kobanê de xwestin çok li gelê têkoşînvan û berxwedêr bişkînin û serê wan bitewînin. Di kesayeta hemû siyasetmedaran de dixwazin tevayî gelên demokratîk û azadîxwaz felc bikin. Bi taybet heyanî ji destê wan were wê jinê biperçiqîn in.

Ji ber vê yekê ji dewleta netewperest, olperest û cinsiyetparêz daxwaza maf, edalet û aştiyê nayê kirin. Her çiqasî jin ji Tirkiyê daxwaza mafê xwe bikin mîna ku ji celadê xwe rehmetê bixwazin. Dayîka Kurd Emîne Şenyeşar ku temenê wê 75 sale, wê bibe 200 roje ku dest bi çalakiya xwe kiriye û daxwaza berdana kurê xwe dike, lê dewleta şerê taybet kurê dayîka Emîne Şenyeşar bernade û wê li pêşiya dadgeha xwe birizînin, ne dûre ku wê jî bi endamtiya terorê sûcdar bikin û bavêjin girtîgehê.

Li hemberî dewleta Tirk a dagirker têkoşîn kirin, berxwedanî û xwe parastin çareserî ye. Dewleteke ku rêz nade jinan û dijminahiya wan dike geleke mirov tu carî maf û azadiya jinê jê hêvî neke.



# Zimanê dayîkê dide jiyankirin

Aras Ehmed mamostê zimanê Kurdî ye. Bi rêya vîdeoyên li gel şagirtê xwe, zimanê kurdî dide hîs kirin. Vîdeoyên wê bi rêjeyek mezin tê guhdarkirin û heskirin.

**Aras Dewrîm/Qamişlo**

Aras Ehmed di gundê Tildikê yê girêdayî bajarê Dirbêsîyê dayik dibe. Bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re bi hewldanek mezin dikeve nav kar û xebatên şoreşê. Peymangeha zimanê Kurdî xelas dike û di sala 2015’an de dest bi mamosteti ya zimanê kurdî dike û roj bi roj hem fêrî zimanê Kurdî dibe û hem jî fêrî şagirtan dike.




### Bi kelecanek mezin şagirtan fêr dike

Aras Ehmed bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re hewil dide kû zimanê xwe pêş bixe. Ji ber ku dema rejîma Bees de çand û zimanê Kurdî ber bi helandin û pişaftinê ve diçû. Ew jî li ser vî bingehê mamostetiya zimanê Kurdî hildibijêre û dibe mamostê zimanê kurdî. Zimanê Kurdî bi şagirtina dide nasîn û dihêle ku ji ziman û çanda xwe hezbikin û pêve werin girêdan û pêşbêxin.

### Vîdeoyên girêdayî zimanê Kurdî di Torên Civakî da Têhe skirin û temaşe kirin

Piştî demekê ji bo zimanê Kurdî zidetir pêş bixe, dest bê çêkirina vîdeoyan bi şagirtan re dike. Di torên civakî da rêjeyek mezin tê guhdar kirin û bala temaşevanan pir dikşîne. Aras tîne ser ziman ku ev di nava zarokên Rojava û beşên din yên Kurdistanê jî vîdeoyên bi vî rengî pir tên ecibandin. Her wiha ev vîdyo ji alîyê hezaran ve tê temaşekirin. Ev pêngav dibe sedem ku zarok zimanê xwe hîn bêtir hes bikin û roj bi roj fêrbibin û pêşbêxin.

### Çand û zimanê Kurdî pêwîste bi her awayî bê pêşxistin û parastin

Aras Ehmed di berdewamiya axaftina xwe de got; ji bona ku zimanê kurdî hîn zidetir di nav zarokan û civakê de pêşbikeve û were hezkirin û li ser torên civakî bi şêwazên cuda em vîdyoyan parve dikin. Bi mamik, gotinên pêşîyan hwd. Ji bo ku zimanê Kurdî ber bi pişaftinê ve neçe dê hewildanê xwe her dem bidomîne. Aras anî ser ziman ku hêvî û daxwazên wî ji zimanzan û mamosteyên zimanê Kurdî yên her çar parçên Kurdistanê heye ku li dijî pişaftinê têkoşîn bikin û li dijî pergala mêtinger û qirker serî netewînin.

### Rêber Apo ji bona parastin û pêşxistina çand û zimanê Kurdî xwedî kedeke bêhempaye

Aras Ehmed di dawiya axaftina xwe de got ku pêşketin û destkeftiyên şoreşê û zimanê dayîkê li Rojavayê Kurdistanê hemû saya fikr û felsefeya Rêber Apo pêşketiye û di nava civakê de gihiştiye asteke pêşketî. Her wiha em 15’ê Gulanê cejna zimanê dayîkê di serî de li Rêberê Netewî Rêber Apo û gelê Kurdistanê û hemû gelên azadîxwaz pîroz dikin.

# Çend gotin li ser ziman

**Volqan Elî**

Ziman ji bo civakan ne tenê amûreke ji rêzê ye ku pê ji hev fêm dikin. Rast e, dibe ku aliyê herî diyar ê ziman, ‘zimanê’ axavtinê be. Dema ku wisa dibe, erk û wezîfeya wê ya yekemîn wekî ‘zimanê axavtinê derdikeve li pêş. Xwe gihandina encameke wisa ne şaş e; lê zêde zêde kêm e. Yanî wekî tê zanîn Kurd bi Kurdî, Ereb bi Erebî, Rûs bi Rûsî diaxivin. Lê faktora ku Kurd kirine Kurd, ereb kirine Ereb, her çi qewm û etnîsîte be tiştê ku ew netewe kiriye ew netewe zimanê ku pê diaxive.

Li gorî lêkolînên arkeolojîk û antropolojîk (zanista ku mirov dike mijarên lêkolînên xwe) şoreşa ziman texmînî 50-60 hezar sal berê li Hîlala Bi Bereket pêk hatiye. Dîsa serdema dawî ya qeşayê 20 hezar sal berê bi dawî bûuye, piştî wê bi demeke kurt jî li mezopatamyaya jorîn yanî navenda Kurdistanê, şoreşa Neolîtîkê çêbûye.

Ji ber ku mijar bi qasî bi çend zanistan neyê ronî kirin kûr e, em neçar in zêde nekevin hin mijaran. Lê dîsa jî hewce dike, bi çend mînakan li ser were sekinîn.

Piştî ku şoreşa Neolîtîkê dest pê kiriye, şoreşa ziman ku li vê erdnîgariyê dest pê kiribû gihaştiye qonaxeke nû. Her tiştê ku li xwezayê, hatiye bi navkirin, navek hatiye lê kirin. Heta gelek teknolojî û kişfên nû hatine bi pêşxistin û ji van her yekê re navek hatiye peydakirin. Mînak, piştî genim hatiye çandin û çinîn, bi destarê ku hatiye vedîtin nan hatiye çêkirin. Bi rêya tekelê ku hatiye vedîtin erebok ji bo barkişandinê hatiye çêkirin. Dîroknasê mezin Gordon Chîlde van vedîtinan dişibîne pêşketinên zanistî yên di sedsala 16. li Ewrûpayê hatine.

Em dikarin bêjin hemû şoreşên civakî yên dîrokî ku mirovahî gihandine asteke pir pêşketî ya zanistî û civakî, xwe dispêrin şoreşa ziman û şoreşa Neolîtîkê.

Piştî ku bi şoreşa Neolîtîkê, şoreşa ziman cara duyemîn xwe misoger kiriye, edî ‘ziman’ ne tenê bi navlêkirina tiştan û axavtinê sînordar maye. Pêşketinên di aliyê ziman de mîraseke pir mezin a çandî (wêje, mîmarî, perwerde, muzîk, hunerên curbicur û hwd.) afirandiye. Zimanê ku di destpêkê de ji çend dengan pêk dihat, êdî bûye nasnameyê wan civakan. Yanî di civaka mirovahiyê de pirrengînî bi pêş ketiye. Etnîsîte, qebîle, eşîr, gel, ol, milet, netewe peyda bûne. Ji ber vê yekê, ziman tenê wekî amûrê bi dest girtin pir kêm dimîne. Mînak, hê pir ji beriya Sumeran nivîsandin hatiye keşfkirin. Gelan, etnîsîteyan pê serpêhatiyên xwe bi şiklê nivîs ji dîrokê re hiştine. Jixwe ji beriya wê jî, civakan serpêhatî û hunera xwe bi çîrok û mîtolojiyê neqlî hev kirine. Kîjan ji van dibe bila bibe, di encam de berhemeke faktora ziman e. Yanî dîroka civakekê, bi maneyekê berhema ‘zimanê’ wê civakê ye. Wêje, huner, zanist jî her wisa. Eger hemû yek bi yek werin vekirin jî, di encamê de derdikeve holê, her tişt bi şiklekî ji şiklan bi ‘ziman’ re eleqadar e. Lewra hêzên dagirker di destpêkê de ziman qedexe dikin. Tê zanîn, dayik bi taybetî di civakên Rojhilata Navin de çavkaniya ‘ziman’ in. Yanî her yekê/î ji me, mamosteya wî ya ziman a destpêkê dayika wê/î ye: Piştre hemû civak…

Ne ku nayê zanîn lê ji ber ku pir balkêş e, mînakek heye divê em bidin. Piştî berxwedana Şêx Seîdê kal, aqilmendên dewleta qirker a faşîst kom dibin. Mijar ew e ku dê çawa bikin ku Kurd bi Kurdî neaxivin, ‘zimanê’ xwe ji bîr bikin. Yek ji aqilmendên Mistoyê Kor (di komkujiya 1938’an de şervanên Seyîd Riza ev nav li Ataturk kiribûn) dibêje, pir sosrete; “Hewce dike em keçên Tirkan bi Kurdan re bizewicînin. Ew keçên me dê biçin, ji wan re zarokan bînin. Ji ber ku Kurdî nizanin dê zarokên xwe jî bi zimanê Tirkî mezin bikin. Dibe ku em wisa vê belaya Kurdî ji xwe kêm bikin”.

Ev planê dagirkeriya Tirk li beşa Bakur bû lê li parçeyên din jî polîtîkayên heman encamê didin hatine pêşxistin. Mînak, kembera Erebî ku li Rojava ji aliyê dewleta Sûrî ve hatiye meşandin. Bi armanceke cuda jî be, ji aliyê pişaftinê ve heman encam dane. Niha em di nav de dijîn, ma li kîjan bajarê Rojava çanda Kurdî, Kurdî li pêş e. Mesele ne neteweperestî ye, eger mesele ew be perspektîfa me zelal e, “bila hezar çand û ziman, netewe û milet, ol û tarîqet li cem û di nava aştiyê de bijîn”.

## Têbînî



### Ji helbestê fedî nakin bila ji zimanê dayika xwe fedî bikin

**Kemal Necim**

Nivîskarê Dagistanî Resûl Hemzatof di romana xwe ya bi sernavê `Welatê min Dagistan e` de dibêjê:``Dayika çiyayî, helbestên kurê xwe jî naxwîne, eger bi zimanekî nexweş hatibe nivîsandin.``

Gotineke pir bi wate ye, nirx û hêza nivîsîna helbestan di nava civakên resen de dide nîşandan, nirx û rêza peyv û rêstina peyvan û sazkirina helbestan dide nîşandan.

Diyar e ku helbest ne tenê navgîna derbirîna hest û ramanan e, lê hêza helbestê ya ku xeyalan geş bike û asoyên têgihiştin û ramanê berfireh bike heye. Helbestvan bi helbestê dikare cîhanên cihêreng nîşan bide, serpêhatiyên xwe yên kesane bîne ziman û kêliyên girîng ên dîrokî û çandî belge û tomar bike. Ji ber vê yekê helbest beşeke bingehîn a nasnameya çandî ya gel û civakan e.

Ji aliyê dîrokî ve helbest ji demên kevnar ve pêşketiye û li seranserê cîhanê belav bûye, di nav gelên kevnar ên mîna Sumer, Misri, Yewnanî û Romayî de geş bûye û şopa xwe ya kûr di wêjeya Erebî, Çînî, Hindî û çandên din ên kevnar de hiştiye. Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje ku helbest beşeke girîng a kevneşopa çandî ya gerdûnî ye.

Her wiha helbest navgîneke derbirîna hunerî û afirîner e, ji ber ku helbestvan ziman û wêneyên helbestî bi awayekî nûjen bikar tînin da ku peyam û ramanên xwe bi rengekî afrêner ragihînin.

Di serdema nûjen de, helbest hîn jî cihekî girîng di wêje û çandê de digire, ji ber ku helbestvan bi berdwamî zimanê helbestê nû dikin û li mijarên nû digerin û lêkolîn dikin, ku veguherînên civakê û kêşeyên serdema nûjen nîşan didin. Bi saya teknolojiyên nûjen, weşandina helbestan û belavkirin wan di nav mirovan de bi rêya Înternetê û medyaya civakî hêsan bûye, ev jî rola wê di teşekirina çandê û xurtkirina pêwendiya mirovî de zêde dike.

Mirov dikare bibêje ku helbest derbirîneke hunerî û çandî ya kêmhempa ye ku dem û cih derbas dike, bedewîya ziman û kûrahiya mirovatiyê nîşan dide û ji bo kes û civakên cîhanê çavkaniya îlhamê ye. Ji xwe girîngiya helbestê di parastin û pêşxistina ziman û peyv û biwêjan de jî tê zanîn.

Eger em van danasînan weke tîrêjekê bavêjin ser rewşa civaka kurdî dê girîngiya rêsan û hûnandina helbestan hîna mezintir bibe. Her wiha eger em van danasî, rêgez û pîvanan ji helbestê bidin alî, dê tenê bimîne hunereke qels a rêzkirina peyvan, lê peyvên bê raman, bê bîrdank bê çêj û bê bedewî. Ango helbest ne rêzkirina peyvan e, lê belê zanîn e, raman e, behremendî ye û berî her tiştî berpirsyarî ye.

Mixabin di salên dawî de li nav civaka kurdên kurmancînivîs de nivîsîna helbestan bûye weke karê bêkaran û salane bi dehan berhem û pirtûkên bi navê helbestan têne çapkirin û weşandin. Li şûna ku bibin bingeha nasnameya çandî ya vê civakê, dibine egera kirêtkirin û xerabkirina ziman û çêj û bîr û bîrdanka civakê. Lewma ew dayika çiyayî ne şaş bû dema ku helbesta kurê xwe jî nedixwend eger xweşik nehatiba nivîsîn.

# Her tişt bi kedê dibe!

**Manî Awyer**



Ev rastîyeke, heya niha gelek nivîs, pirtûk, dahûrandin, ser werzîşê hatiye çêkirin. Lê belê mesela werzîş û tenduristiyê cihek girîng di jiyana mirovan da digre, dayîkbûnê heya dest dayîna jiyanê jî berdewam dike. Yanî bi kurtasî giringîya werzîşê mijareke sereke ya jiyana mirov e. Yanî mijareke her tim lêkolîn li ser hatiye kirin, ji bona pênaseyeke rast jêre bê kirin û zêdetir jî ev bawerî bi vî awayî tê avakirin ku di jiyana mirovan de bimîne bibe rojev. Mirov dikare bibêje ku mijara werzîşê yek ji mijarên ku ti cara kevin nabe, ti caran girîngiya wê kêm nabe, pêwîste her tim di rojeva mirov de be. Eger mirov pênaseyeke resen ji bo werzîşê bike, rastiya wê tê xuyakirin lê naveroka wê têr û tijî ye.

Tevgerînên ji bo laş rojane tên kirin, bi şêwazeke disîplînî û bername pêwîste jêre bê dayîn. Hin tevgerînîn bi westandin bên çêkirin ku pêwîste demek cûda bê dîtin ku ji bona laşê mirov xudan bide. Ev bernama ku însan cûreyên tevgerînê dikin ji bo armancakê ye, ew jî ji bo parastina laş mirove wek ``spor`` bi kurdî jê re dibêjin ‘werzîş’. Girîngiyeke çawa em bidin sporê, pêwîste em pênaseyek çawa bikin? Heger em werzîşê bikin wê çê bandorê li ser laş bike? Heger mirov neke wê çi bandoriya neyînî li ser laşê mirov çê bike? Em ser van hurgulîyan bisekinin. Ev erdnîgariya em tê de jiyan dikin, wek Rojhilata Navîn û ev herêma em tê de dijîn, wek Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêbazê werzîşkirinê bi sê mijara em dikarin pênase bikin. Sê pêwîstiyên zanistî, civakî û rewşên girêdayî laşê mirovan her tim bi mirov re dijîn û zindîne û nikarin jê qut bibin. Qutkirina ji van pêwendiyan, tê wateya mirina însan, tê wateya xilasbûna asta xweparastina mirovan. Dema pênaseya mirov tê kirin, sê pêdiviyên mirov hene, mirovbûyîn, zindîbûyîn ser van pêdiviyan tê avakirin. Mirovbûyîn ser bingehê her sê pêdiviyan tê pênasekirin. Herger mirov ji yek ji van pênaseyan qut bibe yan jî tevgerînek xelet bê kirin dê bê dîtin ku mirov bê mecal (seqet) bimîne. Yanî ev tevgera laş jî xwe dide xuyakirin. Yek ji van pêdiviyan xwarin û vexwarin e, ya dûyem cih û ya sêyem jî cil û berg û parastine. Ev parastin ji bo asta xweparastin e, hem jî ji bo laşê mirov û parastina rûhî ye. Ev parastin ji fêkî, av, xwarin û nan pêk tên. Ev pêdivî li gorî hecmê laşê mirov tê guhertin. Pêdiviyek din jî cil û xweparastin e.

Ji bo jiyana însan berdewam bibe û bi tevger be, herwiha laşê te aktîf be, cihekî ku mirov tê de weke jiyana ku were berdewam kirin tunebe, her tim wê bi xeterî jiyan bike. Mirov xweparastina cewherî bingeh negire, parastina laş bê kirin. Xalek din jî, mijarê rûhî û asta xwe parastina insan. Çawa ev xalên ku me anî ser ziman, çawa ji bo jiyana mirov girîng be, di heman demê de pêwîstiya insan bi asta xweparastina derûnî jî heye. Asta xwe parastin ya ku derûniya mirov, mêjî eleqadar dike, têkiliyên navbera zanista analitik (analitik zeka) û zanista hestî (duygusal zeka) peywendiyê wan bi hev re heye, jê re dibêjin pewîstiyên manewî. Pêwîstiyên manewî wek xwandin, fêrbûn, fêrkirin, danûstandin, civakbûyîn û sîyasîbûyîn e tişteke bi mêjî mijûl dibe, tiştekî zêdetirî laşê mirov heye, jê re dibêjin pêwîstiyên manewî yên mirovan. Dixwazim bêjim ku werzîş, pêdiviyeke herî girînge, ji bo bandoreke neyînî ser xwarin û vexwarina ku hatiye xerckirin neke û heman demê nebe pirsgrêk ji bo derûniya mirov, ji bo rêbazek baş bê bikaranîn ev hêza ku xwarin û vexwarinê digire, bişaşîtî neyê xerckirin alîkar bibe ji bo mêjî û laşê mirov, ev tevgerîn girêdayî mêjiyê mirove, laş erk dide mêjî.

Mirov dikare têkiliya navbera laş û rûhê mirov de ji aliyê erenî de binirxîne, karê pêwîst dikeve ser milê werzîşê de. Dema ku bi vê pênasê em nêzî werzîş dibin, her kes hejandinek bi xwe re bide avakirin, werzîş çiye ev qas girînge? çima em berê bi vê girîngiyê nedihesiyan, kêleka vê em lê hesiya bin jî çima me girîngî ne dida werzîşê, çi guhertin veguhertin di kesayet de çê dike? Ev sê pirsa ger mirov ji xwe bipirse bê guman her mirovek dê bibe xwedî biryarek ku dest bi werzîşê bike. Çawa dibêjin “mêjiyekî tendurist, laşekî tendurist peyda dibe. “ji bo vê yekê pêdivî bi werzîş heye. Hin cara pênaseyek wisa tê kirin ku werzîş tenê ji bo ciwana ye, yan jî temenekê xuyayî werzîşê bikin, ev nêrîn ne tenê şaşe, nêrînek ne zêde tenduriste jî. Mirov dikare bibêje werzîş dema mirov ji dayîk bû, heya laşê wî/ê ber bi helandinê ve diçe pêwîstiya mirov bi werzîş heye. Ji ber di zaroktiyê de tevgera laşê însan zindiye, di ciwantiyê de tevger hîn bi plansazî dibe û heyanî kalbûnê de jî li gorî pêwîstiyê tevger çê dibe. lê belê ya girîng pêwîste werzîş ji roja dayîkbûnê heta mirina mirov bê kirin. Çawa ji bo zanist pênase dikin, dibêjin ``fêr bibe`` axaftinek tê nasîn ya Hz Mihemede, gerek pênaseyek wilo ji bo werzîşê jî bê kirin, yanî heya ku tu zindî be gerek tu xwe ji werzîş qut neke. Lê bê guman civaka ku em têde jiyan dikin, civakake temeneke piranî ciwanin. Da ku ciwan pêşeroja civakê baş plansaz bikin, pêwîste zarok û ciwanên me xwedî plansazî û bername bibin. Yek jî ev nirxandinên şaş yên ku derheqê werzîşê de tên kirin bikarin şîrovek jê re bikin. Êrîşên li dijî laş ji derve tên bikaribin xwe biparêzin. Ev şîroveyeke gelekî girînge û pêwîste em bingeh bigirin. Niha yek ji van pênaseyan dikare neyînî bandor bibe, her roj bandoreke genetîkî ser me çê bike, mirinekê ku hêdî hêdî me dikuje, ku em nizanin çawa xwe plan bikin, çawa bername deyînin, ji ber ku bername û plansazîyek me nîne. Kîjan kesayet û kîjan desthilat, kesayetên ku civakê temsîl dikin, kîjan navend, kîjan sazî, kîjan dewlet, û kîjan komeleyên ku bandora wê hebe dibe xwedî bername û li gorî berjewendiyê takekesî plansazî amade dikin. Yanî ev tevger û enerjiya di laşê me de cih digire, em nikarin sûdê jê bigirin û demê me jî tên dizîn. Em niha ji bo pêşiya diziyê bigirin û keda me vala dernekeve, pêwîste em xwe bi bername û plansazî bikin, da ku keda me û wextê me ji bo xizmet û civata me be. Ji bo em nebin beşekî bernameya her kesekî/ê. Yek jî ev siyaseta ku hemberî me û civaka me tê meşandin û gelek mirovan re dibêjin dermanê vê/î nîne, yan jî dermankirina vê/î pir zehmete. Ev şîroveyeke cih deye. Mirov dest pê neke tu dikarî bêjî her tişt bêdermane. Mînak madeyên hişbir, di vê nivîsê de em nikarin bandora madeyên hişbir rêz bikin lê dijminê herî mezin ê ku bikare madeyên hişbir re şer bike spor yan werzîş e. Em dikarin vê pirsê ji xwe bikin çê taybetmendiyê mirov heye ku mirov nikare werzîş bike? Yan jî çi taybetmendiyên mirovan yên aliyê neyînî nikare werzîşê bike? Mirov her tim lêgerîn daye û pêdiviya mirov pê heye ku enerjiya xwe vala bike, dema ku mirov bê tevger be, werzîşê neke, karekî herî hêsan û sekneke herî xeter û rehet bala mirov bikşîne û ber vê ve biçe û ev tevger û enerjiya cem xwe vala bike, ji bo mêjiyekî rehet ava bike. Ciwanên ku tevgera wan pir kêm be, zû fêrî madeyên hişbir dibin. Ew rewşa ku niha civaka me li hemberî madeyên hişbir jiyan dike baş tê zanîn. Çawa bandora madeyên hişbir ser laşê mirov çê bike pir zehmete, di heman demê de dema mirov fêrbûyîna laş ya werzîş çê bike laş dê 180 derecayan mertalekê bide avakirin. Werzîş panjehra madeyên hişbir û nexweşîyane. Armanca sereke ya belavbûna madeyên hişbir, nebûna bername û nebûna lêhûrbûn û nekirina werzîşê ye. Çawa ku wêje sînoran nas nake, werzîş jî sînora nas nake. Mirovê ku werzîşê neke aliyê zanista tengasiyê jîyan dike. Ji bo xwe û ji bo berjewendiyê xwe difikire, miroveke takekese û ezeze. Lê taybetmendiya mirovê werzîşê dike civakî û gerdûnî ye. Ji ber însanekî ku werzîşê neke dervê xwe nikare ti tiştekî bifikire û pêk bîne. Yanî bi kurtahî newerzîşkirin, nefikirandinê pêş dixe. Ciwaneke ku sporê neke ji taybetmendiya xwe ya civakbuyînê qut dibe û ji bûyerên erênî yên di gerdûnê de diqewimin bêpar dimînin. Lewra yek ji pirsgrêkên herî girîng yê Herêma Rojhilata Navîn a ku em têda jiyan dikin pirsgrêka nexweşiyên derûnî û mêjî ye. Ev nexweşî ji sedî 90 ji enerjiya laşê mirov de di cihê ne rast û ne pêwîst bikaranîn û derveyî kontrola vîn û îrade yê de tê xerckirin û şewazdayîn. Lê werzîşkirin bê guman bandore xwe ser derûnî, tevger û enerjiya şaş bikaranînê aliyê erênî de jî dike û tu dikarî bêjî dermaneke ji bo van tevgeran e. Mirov ji tiştê baş hez dike ev taybetmendiyeke xwezayî yê mirove, mirov tam û tamxweşîyekê digere. Heman demê de mirov xweşikbûyînê jî digere ev taybetmendiya hemû mirovên ku gerdûnê de jiyan dikin de heye. Bijîşk û derman nekarin bi qasî werzîşê bibin alîkarê tenduristiya mirov. Eger em di aliyê derûnî de hez bikin ku her tim e bi erênî bifikrên, demên xweyî vala bi werzîşê dagirin. Di heman demê de ji bo ku madeyên hişbir yên ku dijmin li ser me bi kar tîne vala derxîne, herwiha li hemberî nexweşiyên xem û strês werzîş wek mertalekê di destê medaye. Eger em van taybetmendiyan ji xwe re bidin avakirin dê laşekî tendurist ava bibe, laşekî tendurist jî fikreke tendurist ava dike. Yanî bi kurtahî rojên bi tendurist bi zanist, girêdayî werzîşê ye. Rojê bi tendurist ji were dixwazim.



# Rûyê Reş yê faşîzma AKP’ê `Doza Kobanê`

‘Doza Kobanê’ parçeyek ji polîtîkayên qirkirina Kurdan e û bi armanca tasfiyekirina siyaseta demokratîk hatibû vekirin, cezayên giran li dehan rêveber, endam û siyasetmedarên HDP’ê birîn. Ev doza ku diyardeya herî zelal a zîhniyeta dij-kurd e, tu têkilya wê bi hiqûqê re nîne û ji aliyê desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê ve hatiye pêşxistin e. Doza Kûmpasê ya Kobanê bi temamî dozeke siyasî û qirkirinê ye û Dadgeha ku ev biryar daye Jî dadgeha qirkirinê ye. Li hemberî wê jî û ji bo têkbirina faşîzma AKP-MHP’ê têkoşîneke demokrasî ya hevpar pêwîste.

**Argêş Gewda/Qamişlo**



Di Cotmeha 2014`an de çeteyên DAIŞ’ê êrîşî bajarê Kobanê kirin. Ev êriş li her çar perçeyên Kurdistanê hat şermezarkirin, li Bakûrê Kurdistanê jî sîyasetmedar û rewşenbîran bi daxuyanî û çalakîyan bertekên xwe anîn ser ziman. Lê dewleta Tirk a dagirker li hemberî wê xwe negirt û bertekên li dijî êrîşa DAIŞ’ê wekî sûc dît û bi navê doza Kobanê gelek sîyasetmedarên Bakurê Kurdistanê girtin û bi 10’ê salan ceza li wan birîn. Derbarê doza Kobanê de parêzerê dozê Kenan Maçoglu persiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Destpekê hûn dikarin derheqê vê Dozê de hin agahî bidin?**

Wek tê zanîn di Cotmeha 2014`an Kobanê rastî êrîşek teroristî ji aliyê DAIŞ`ê ve hat. Di wê êrişê de jin û zarok jî di nav de gelek mirovan jiyane xwe ji dest dan û birîndar bûn. Gelek kes bê mal û war man. Li dijî vê êrîşê ne tenê gelê Kurd û herêmê rabûn ser piyan, tevahiya gelên azadîxwaz rabûn ser piyan û êriş şermezar kirin. Gelek sîyasetmedar û rewşenbîrên Bakurê Kurdistanê jî helwestên xwe li hemberî wê qirkirinê dan nîşan dan. Gelek parlementer û sîyasetmedarên navdêr yên HDP`ê helwesta xwe ya mirovî dan xuyakirin. Piştî vê helwestê ew ji aliyê rayedarên dewleta Tirk bûn armanc. Di sala 2016’an de li dijî siyasetmedarên kurd li Bakûrê Kurdistanê êrişeke hemwext dan destpêkirin. Di Serî de hevserokên HDP`ê Silhedîn Demîrtaş û Fîgen Yuksekdag di nav de gelek parlementerên HDP`ê hatin girtin û derheqê wan da doz hat vekirin. Ev doze bi navê `doza Kobanê` hat bi navkirin. Di vê dozê de 180 sîyasetmedarên Kurd dihatin darizandin. Dozgerê wê jî bi taybet ji aliyê Erdogan ve hatibû erêkirin. Ev doze li alîyê Dozgerîya Enqerê Dadgeha Mezin ya bîst û duyemîn dihat meşandin. Sîyasetmedar û dilgirtîyên dozê bi hinceta `endamtîya rêxistinê, parçekirin û binpêkirina yekîtîya dewletê` hatin tewanbar kirin.

**Bertek û Helwestên dilgirtîyê dozê çi bûn?**

Qaşo bi navê ewlehiyê sîyasetmedar ne di anîn dadgehê. Ji ber vê bi rêya weşana zindî tevlî dozê dibûn. Dema ku pir cara dihatin dadgehê zext li ser wan dihat meşandin. Mafê wan yê xweparastinê ji dest wan dihatin girtin. Bi mafên wan yên xwezayî jî dihatin qedexe kirin. Ev jî ji ber wan astengîyan ti cara serî netewandin. Lepîrsînek siyasî bû ti aliyê wê yê hiquqî tinebû. Ev jî ji ber bertek û helwestên xwe daynîn holê pir cara ên dihatin dadgehê.

**Di wê dozê siyastmedarên ku dihatin dadgehkirin kîbûn?**

Hevserokên Partîya Gelan Ya Demokratîk yê HDP`ê Silhedîn Demirtaş û Fîgen Yuksekdag, parlementerên HDP`ê Gulten Kişanak û Sebahat Tuncel, Selma Irmak û Ayla Akad Ata û Sirri Sureyya Onder, Altan Tan û Ayhan Bilgen. Hevserokê Şaredarîya Bajarê Merdîn`ê ya mezin Ahmet Turk û hwd. Bi sedan sîyasetmedarên ku me navê wan nehejmartiyî hatin mehkum kirin. Ev dozeke sîyasî di alîyê Komaleya Îstîxbarat ya Tirk û AKP`ê û MHP`ê ve dihate te şopandin. Bi navê hiquq û edeletê tiştek vê dozê tune ye. Ev doz nêzî 8 sale berdewam dikir û bi navê şahidê veşartî û îfadeyên polîs û leşkerên tirk ev doz dihate meşandin û sîyasetmedar bi şêwazeke derhiquqî hatin cezakirin.

**Doz bi encam bû, cezayê hatin birîn hûn dikarin bi me re parve bikin?**

Silhedîn Demîrtaş: 42 sal
Fîgen Yuksekdag: 30 sal û 3 meh
Perwîn Oduncu: 22 sal û 6 meh
Alp Altinors: 22 sal û 6 meh
Nazmi Gur: 22 sal û 6 meh
Zeki Çelîk: 22 sal û 6 meh
Zeynep Karaman: 22 sal û 6 meh
Cîhan Erdal: 20 sal û 6 meh
Dilek Yağlı 20 sal û 6 meh
Günay Kubilay: 20 sal û 6 meh
Îsmaîl Şengul: 20 sal û 6 meh
Bülent Parmaksız: 20 Sal û 6 Meh
Ali Ürküt: 17 sal û 1 meh
Zeynep Ölbeci: 12 sal û 9 meh
Gultan Kişanak: 12 sal
Sebahat Tuncel: 12 sal
Mesut Bağcık: 12 sal
Ahmet Turk: 10 sal
Emîna Ayna: 10 sal
Ayla Atak Ata: 9 sal û 9 meh
Meryem Adıbellî: 9 sal
Aynur Aşan: 9 sal
Ayşe Yağcı: 9 sal
Nezîr Çakan: 9 sal
Mesut Bagcık: 9 sal ceza li wan hat birîn.

Herwiha Emîne Beyza Ûstûn, Gulser Yildirim, Sebahat Tuncel, Gulten Kişanak, Altan Tan, Ayhan Bilgen, Gulfer Akkaya, Sirri Sureyya Onder, Can Memiş, Bîrcan Yorulmaz, Aysel Tugluk, Berfîn Ozgû Kose, Îbrahîm Bînîcî, Sîbel Akdenîz jî hatin berdan.

**Herî dawiyê derheqê doza plankirî de tiştekê hûn çi dibêjin?**

Ev doza ji serî heta binî dozeke sîyasî bû. Hatibû amadekirin. Bila gelê me bizane ku, ev sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd dozeke bi rûmet û heq meşandine. Em bangawazîyê hemû gelê welatparêz û demokrat dikin êdî bila vê zilmê qebûl nekin. weke miwekilên me jî anî ser ziman em `ti cara serî natewînin.` Em parêzer jî em dozê dişopînîn. Ev mirove ne sucdarin. Doza mafê gelekî zidetir tiştek nekirine. Em ê serlidana komalayên Mafên mirovan û Dadgeha Mezin ya Awrupa (AÎHM) bikin. Heya dawîyê em ê mafên dilgirtîyê doza Kobanê bişopînin. Em piştgirîya mafên wan bikin û em ê doza wan hertim bişopînin. Em ê şopderê doza heqîqetê bin. Em slavên xwe ji bona ev dilgirtîyên berxweder û malbat û xizmên van ra dişînim.

# `Li hember tecrîdê wê Felsefeya Rêber Abdullah Ocalan bibe rêbazê jiyanê`

**Zana Roj/ Şehba**



**Di çarçoveya pêngava cîhanî ya `Ji Abdullah Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî` Kongira Star û jinên Meclîsa Malbatên Şehîdan li kantona Efrîn û Şehbayê çalakiya konê îdeolojîk û piştgiriya pêngava têkbirina tecrîda li ser Rêber Apo birêxistin kirin. Berdevka Kongra Star Rîhan Elo diyar kir ku xwedîderketina li felsefeya Rêber Apo erka jinên serdemê ye.**

Bi hemdemiya ferizkirina cezayên nû ji aliyê faşîzma Tirkiyê li ser Rêber Abdullah Ocalan, gelê Kurd li çar aliyên cîhanê û Kurdistanê di nava çalakiyan de ne da ku ev tecrîda mutleq li ser Rêber Apo bê rakirin û azadiya fîzîkî pêk were. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo navenda tavahî xebatan e. Kongira Star û jinên Meclîsa Malbatên Şehîdan li Kantona Efrîn û Şehbayê, çalakiya konvedanê ji bo piştgiriya pêngava cîhanî ya `Ji Abdullah Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî` li dar xistin.

Têkildarî çalakiya ku 3 rojan li Parka 4’ê Nîsanê li Navçeya Ehdas hatiye lidarxistin berdevka Kongra Star ya Kantona Efrîn û Şehabyê Rîhan Elo ji rojnameya me re axivî.

Rîhan destnîşan kir ku armanc ji çalakiyê balkişandina raya giştî li ser tecrîda li ser Rêber Apo ye û wiha got: “Faşîzma Tirkiyê bi polîtîke û kîna xwe ya hezar salan her roj siyaseta girankirina tecrîdê li li ser Rêberê mirovahiyê Abdullah Ocalan di girava Îmraliyê de girantir dike. Bi ferizkirina cezayên disiplînê yê dawiyê re, careke din dixwaze îradeya gelê Kurd têk bibe. Faşîzma Tirkiyê di şexsê Rêber Apo de hemû gelê Kurd hedef digire û bi armanca têkbirina doza gelê Kurd roj bi roj tecrîdê girantir dike. Li hemberî polîtîkeyên dijmin yên ku li ser kesayeta Rêber Apo di girava Îmraliyê de tên pêkanîn, tavahî gelê Kurd û yên azadîxwaz di nava çalakiyên navnetewî û yên herêmî de ne. Li ser vê bingehê me jî xwest bi vê çalakiyê em bal bikşînin ser tecrîda ku li Îmaraliyê dibe û her wiha raya giştî li hember vê yekê weke her car bêdeng nemîne û bi erkên xwe rabe”

**`Divê îdeolojiya Rêber Apo bibe rêbazê jiyanê`**

Rîhan di berdewamiya axaftina xwe de anî ziman ku divê îdeolojiya Rêber Apo bê belavkirin û wiha got: “Dijminên gelê Kurd û faşîzma Tirkiyê li hember destkeftiyên doza gelê Kurd û piştgiriya gelên azadîxweaz ji felsefeya serdemê ya Rêber Apo re, hemû pilan û hovîtiya xwe dixe meryetê. Li hember vê yekê divê îdeolojiya azadî û demokrasiyê li her derê bê belavkirin û bibe terzê jiyana civakê. Ev yek me xwest di vê çalakiyê de balê bikşînine. Ji lewra di her 3 rojên çalakiyê de analîz û perspektîvên Rêber Ocalan û semînerên girêdayî îdeolojiya Rêbertî hatin dayîn.”

**`Wê çalakiyên me her berdewam bin`**

Rîhanê wiha naveroka çalakiyê anî ziman: “Li ser esasên ku me anîne ziman de. rêze çalakiyên balkêş hatin orgenîze kirin. Tavahî sazî, rêxistin, partî, tevger û gelê herêmê beşdarî çalakiyê bûn. Di destpêkê de çalakî di roja bîranîna Şehadeta qehreman Heqî Qerar de hate destpê kirin, ji lewra di roja yekemîn de semîna yekemîn ji aliyê saziya Malbatên Şehîdan ve li ser Wateya Şehadetê hate dayîn. Di roja duyemîn de semîner li ser Rastiya Rêbertî her wiha li ser Çand û Exlaq ji aliyê Kevana Zêrîn ve hate dayîn. Di roja sêyemîn û ya dawiyê de semîne li ser Jin û Siyaset her wiha Şerê Gelê Şoreşgerî hatin dayîn. Bi parvekirina van semîneran me xwest em felsefe, îdeolojî û nirxandinên Rêber APO bidin nîşandan ku li ser esasê van rastî û analîzan emê bikaribin hemû pilanên dijmin û tecrîda feriz kirî têk bibin û azadiya Rêber APO misoger bikin. Wê ev nebe çalakiya me ya dawiyê di çarçoveya têkbirina Tcrîda girankirî û azadiya fîzîkî ya Rêbertî emê xebat û çalakiyên berfirehtir birêxistin bikin”.

# ‘Fikir û felsefeya Rêber Apo ji tevahiya pirsgirêkan re çareserî ye’

Endamê Yekîtiya Rewşenbîran a Kantona Cizîrê Cemal Çaçan diyar kir ku ew ê vê berxwedanê li tevahî cîhanê zêdetir berfireh bikin û ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo çi pêwîst be ew ê bikin û got, “Îro felsefeya Rêber Apo li hemû cîhanê belav bûye û ji bo tevahiya pirsgirêkan çareseriye.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 10’ê Cotmeha 2023’yan de li 74 navendên cihanê pêngava bi duruşmeya ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirkê kurd re çareseriya siyasî’ hat destpêkirin. Pêngava azadiyê li seranserê cîhanê berfireh bû û belav bû. Her wiha qonaxa duyem a pêngavê jî di 1’ê Adarê de dest pê kir. Di çarçoveya pêngavê de bi çalakiyên girseyî yên 8’ê Adarê, Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê û 21’ê Adarê Newrozê daxwaza azadiya fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan hat kirin. Piştre jî bi boneya 4’ê Nîsanê rojbûna Rêber Abdullah Ocalan çalakiyên girseyî hatin lidarxistin.

Di vê çarçoveyê de, endamê Yekîtiya Rewşenbîran a Kantona Cizîrê Cemal Çeçan ji Rojnemeya me axivî û wiha got: “Kî paradîgmaya Rêber Abdullah Ocalan dixwîne, bandorê lê dike û li gorî jiyana xwe nasdike. Ji ber vê yekê li seranserî Ewropayê dengek bilind bû. Gelek akademîsyen, nivîskar, hiqûqnas û kesên ku berê endamên CPT bûn beşdarî çalakiyên di çarçoveya pêngavê de bûn.”

**‘Ev şer 50 sal in didome’**

Cemal Çeçan da zanîn ku ne tenê kurd daxwaze azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan dikin, êdî tevahî gelê blindest daxwaze azadiya wî dikin û wiha got: “Fikrên Rêber Abdullah Ocalan li tevahiya gelên herêmê bandor kiriye. Dewletên dagirker dixwazin me bêdeng bikin. Lê em vê qebûl nekin. Ger tecrîd neyê rakirin û azadiya fizîkî ya Rêber Apo pêk neyê, wê berxwedan li girtîgehan mezin bibe. Em ê vê berxwedanê li tevahî cîhanê jî berfireh bikin. Ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo çi pêwîst be em ê bikin. Îro felsefeya Rêber Apo li hemû cîhanê belav bûye. Ev tecrîd di şexsê Rêber Apo de li çar parçeyên Kurdistanê tê meşandin. Divê hemû cîhan vê yekê bibînin. Ev şer 50 sal in didome. Heya niha tu kes xwe berpisiyar nedîtiya ku azadiya Rêber Apo ya fîzîkî pêk bîne, ji ber ku hemû dewlet dizanin ku wê pirsgirêka kurd çareser bibe û bi riya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan her kesê bindest û bêmaf maye wê azad û rizgar bibe. Lê dewletên dagirker vê yekê nakin. Ji ber ku ji paradîgmaya Rêber Abdullah Ocalan ditirsin.”

**‘Pêngav encama hêza paradîgmaya Rêber Apo ye’**

Cemal di berdewamiya axaftina xwe wiha got: “Ez her kesên ku beşdarî pêngava ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî’ bûne, ku di 10’ê Cotmeha 2024`an li seranserê cîhanê li zêdeyî 100 welatan hate destpêkirin, her kesên ked dane, bi hemû hêza xwe ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd têkoşiyane, bi rêzdarî û hurmetî silav dikim. Têkoşîna wan pîroz dikim. Destpêkirina vê pêngavê, encama têkoşîna Rêber Apo ye ku 50 sal in bê navber raber dike. Rêber Apo ji bo hemû gelên cîhanê kedeke mezin da. 25 sal in li Îmraliyê di bin tecrîdek giran de ye. Bi taybetî ji 25’ê Adara 2021’ê ve tecrîd ewqas hat girankirin ku bi ti rengî agahî ji Rêber Apo nayê girtin. Ez vê berxwedana bi wate ya Rêber Apo silav dikim, hezkirin û rêzdariyên xwe radigihînim. Bi kampanyaya ku 10’ê Cotmehê hate destpêkirin re, gelên bindest, gelên azadîxwaz, rewşenbîr, hunermend, jin û tevgerên ekolojîk azadiya xwe di fikir û felsefeya Rêber Apo de dibînin. Ev hêza paradîgmaya Rêber Apo nîşan dide.”

Cemal da zanîn ku sedema girankirina tecrîdê ew e ku Rêber Apo ji xeta sêyemîn gav bi paşve neavêtin. Ji ber van rastiyan dest bi pêngava ‘Azadî ji bo Abdullah Ocalan, çareseriya siyasî ji bo pirsgirêka Kurd’ hat kirin. Bawer im ku wê salvegera kompoyê ya 26’emîn tu sedem nemîne ku Rêber Apo li Îmraliyê bê ragirtin û ev kampanya bigihîje armanca xwe. Heta ku encam bi dest bikeve her kesê tevlî vê kampanyayê bûye, divê tê bikoşe. Heta Rêber Apo azad bibe û pirsgirêka Kurd çareser bibe bawer im ku wê tê bikoşin.”



**‘Çareseriya pirsgirêkên siyasî di fikir û fesefeya Rêber Apo de ye’**

Cemal Çeçan di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em wekî nivîskar û rewşenbîr heya astekî baş ji pareznemeyên Rêber Abdullah Ocalan û pirtûkên wî hatine xwendin, her wiha di pareznameya Rêber Apo ya 5`e mîn de, mirov xwe nasdike, jiyanê nasdike û hişmendiya wan tê vekirin û ji wê bergala dagirker xilas dibe. Hewledanên me hene ku hîn zêdetir em pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan bixwînin û em wî fêm bikin, wek tê zanîn ku niha tevahî civak li ser fikir û felsefeya Rêber Apo tevdigerin, êdî felsefaya wî li tevahî cîhanê belav buye, ji ber vê yekê êdî her kes daxwaze azadiya Rêber Apo a fîzîkî dikin, ji ber ku dizanin çareseriya pirsgirêkên siyasî di fikir û fesefeya wê de ye.”

# Zextên faşîzma Tirk li ser Rojnamegeriya Azad berdewam e

**Navenda Nûçeyan**

**Li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê zext û zordarîyên ser rojnamevanan her roj zidetir dibe.Li dijî wan binçavkirin, işkencekirin û kuştin dewam dike. Armanca desthilatdariya faşîst a Tirkiyê ji van kiryaran bêdengiya dengê rojnemevanên azad e.**



Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê rojnemavênên çapemeniya azad pir xebatên giranbuha didin meşandin. Li hemberî dek û dolabên AKP`ê û MHP`ê, dibin dengê civak û heqîqetê. Desthiladarîya AKP`ê û MHP`ê wekî salên borî, vê salê jî ji bo veşartina rastiyê astengiyan derdixe pêşîya rojnamevana û li dijî wan kiryarên dijmirovî dike.

**Di sala 2022`an êrîş û zext li ser rojnamevanan zêde bûn**

Dema em binpêkirinên mafên rojnamegeran ên di nava sala 2022 an da mêze bikin, derheqê rojnamegeran da dehan doz hatine vekirin. Di heman salê di 8’ê Pûşber ê de êrişeke li dijî rojnamevanan hat destpêkirin û 16 rojnamegerên Kurd hatin girtin. Piştî 13 mehan ew ji girtîgehê hatin berdan. Di lêpirsîna 25’ê Cotmeha heman salê de jî êrişeke bi navê tîmên taybet ku navenda wê Enqera ye hat destpêkirin û 9 rojnameger hatin maxdur kirin.

**Sala 2023’an bû sala binpêkirinên li dijî rojnamegeriya azad**

Di 25 û 29’ê Nisana 2023’an de jî bi du lêpirsînên din rojnameger hatin binçavkirin û bi mehan di girtîgehê de hatin hiştin. Rojnameger Dicle Muftioglu ku di nav wan de bûn hê jî di girtîgehê de ye û nehatiya berdan. Desthilatdariya AKP-MHP’ê li gel van hemû mînakan di 2023’an de imza xwe avêtin binê vê kiryara nû ya qaşo rojnameger bi nûçeyên xwe peywirdarên li “dijî terorê hedef didin nişandan”. Rojnameger ê ku navê wî Firat Can Arslan di nava van rojnamegaran da hatibû binçavkirin, li gorî zagonên dewleta Tirk gorî xalê TMK 6/1 ya 1991’an hat girtin. Dîsa Edîtorê Rojeva Azad Furkan Karabay Bi boneya “peywirdarê li dijî terorê hedef nişan daye” û “tomet li wan kiriye” hat tewanbarkirin û di rojên dawiya salê de hat girtin.

Bi van minakan eşkere bû ku zagona 7418’an ku bi navê “zagona dezeformasyonê” desthilatdariya AKP`ê û MHP`ê di 2023’an de derxist ber çava ku berovajiyê armanca navê zagonê, weke zagona sansurê bikar tîne. Ji ber zagona sansurê derbarê rojnamegeran de lêpirsîn dan destpêkirin û wan kirin bin çavan. Rojnamegerê destpêkê de bi vê zagonê hat girtin Sînan Aygul e. Rojnameger Tolga Şardan, Edîtor Dinçer Gokçe û Nûçegihan Cengiz Erdinç hatin binçavkirin. Ji wan Tolga Şardan hat girtin. Di sala destpêka ku ev zagon ket meriyete de bi kêmanî 26 rojnameger hatin binçavkirin, hatin darizandin û hatin girtin. Ên ku tên zanîn bi giştî 29 bûyer hatin qeydkirin.

**Sala 2023’an danêyên Îstastikên Rapora Ser Mafên Rojnamevana**

Rojnamevanên rastî êrîşa hatin:36
Serdegirtênên malên rojnamevana:43
Rojnamevanê hatin binçavkirin:119
Rojnamevanên hatin girtin: 36
Rojnamevanên rastî tundiyê hatin: 64
Rojnamevanên hatine tehdit kirin: 38
Rojnamevanên hatine astengkirin: 110
Rojnamevanên ku rastî lêpirsînan hatin: 75
Rojnamevanên doz li wan hatine vekirin: 66
Cezayên Hatine Birîn: ji bona 44 kesên endamên rojnamegerîya azad sala 2023’an da 48 sal 9 meh 14 roj cezayên girtîgehê, 147.486.00 LT cezayê pere hatîye birîn

**Sala 2024 bi heman zextan didome**

Di destpêka meha Nîsanê de mafê bingehîn yê Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Abdullah Zeydan bi destê Komaleya Hilbijartinên Mezin(YSK`ê) hat betalkirin. Gelê Wan’ê bi yekser daket kolanan û xwedî li Şaredarê xwe derket. Rojnamegerên êriş û tundiya polîsan a li dijî van çalakiyan di şopandin rastî tundiya polîsan a gaza isotê, êrişa guleyên plastîk û ava şid hatin. Polîs wêne û dîmenên rojnamegeran dest danîn ser û rojnamegerên tundiyên polêsan kişand bi gefên mirinê li van hat xwarin. Di 1’ê Gulanê de li Stenbolê jî heman wêne derket holê. Polîsan rojnamegerên girseya kedkar û xebatkarên dixwestin bimeşin Taksîmê dişopandin derp kirin , destên hin ji wan kelepçe kirkin û ew kirin binçavan. Di Saraçhaneyê de li ser ferana amîrê polîsan a; “Çapemeniyê durxin” rojnameger rastê êrişeke berfireh hatin. Di vî êrişê de gelek rojnameger û endamên ragihandina azad birîndar bûn, xebatên wan hatin astengkirin. Di vê mehê de jî astengiyên li dijî medya dijîtal û xwe gîhandina nûçeyan dewam kir. Di gorî danêyên ne fermî 3 malperên internetan hatin girtin. Xwegîhandina 23 nûçe û 16 naverokên medya dijîtal hatin astengkirin. Zidehî van astengkirinan li ser daxwazên bersucên destdirêjiyê, îstîsmara zayendî, û gendeliyê pêkhatin. Bi operasyona navenda xwe Stenbolê re polîsên Belçîkayê bi rengekê şêlevan avêtin ser Medya Haber û Stêrk TV’ê jî. Derî hatin şikandin, zîyanek mezin dan alavên teknîka weşanê, ji bo weşan bê astengkirin qabloyên cîhazan hatin birîn. Eşkera dibe ku zext û êrişên li ser rojnamegerên kurd di pêşengiya desthilatdariya nijadperest de li her derî didome. Van êrişên bêbext û dijî mirovî heta niha rojnamegerên Kurd, çapemeniya azad bêdeng nekir û dê ji vir û şûn ve jî bêdeng neke.

## Serxistina hilbijartinên şaredariyan riya çareseriyê ye



**Dilyar Cizîrî**

Meclîsa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 12’ê Kanûna 2023’yan de hevepymana civakî ya nû erê kir. Di hevpeymanê de pirengî û rewşa di hemû kantonan de di ber çavan re hate derbaskirin. Ev guhertin di demekê de ku dewleta Tirk a dagirker, Îran, hikûmeta Şamê, Rûsiya û komên çete yên girêdayî wan bê navber di nava hewldanan de ne ku aloziyan di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de zêde bikin, pêk hat.

Bi wate her kesî dît dewleta Tirk çawa êrişî binesaziya herêmê û navendên xizmetguzariyê kir. Hikûmeta Şamê dorpêça li ser Şehba, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê zêde kir û li Dêrazorê bê navber xwestin tevlîheviyê derbixin. Di encamê de di warê sotemeniyê, mijarên xizmetguzriyê û ewlekariyê de gelê herêmê alozî jiyan kirin.

Ji ber wê tevahî Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hêvî û baweriyeke mezin pêşwaziya hevpeymana civakî ya nû kirin. Niha jî bi heman rengî li hilbijartinên şaredariyê û xebatên wê dinêre. Civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi salane hemû cûreyên herî zehmet ên planên dijberiyê û êrişan derbas kirin, îro jî di wê baweriyê de wê bi hilbijartinên şaredariyan û sîstema nû ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de aloziyên ji aliyê dijberan ve hatine derxistin, derbas bike.

Ji ber wê hilbijartiyên şaredariyan ku tê payin di 11’ê meha Pûşberê de li tevahî kantonên Bakur û Rojhilatê Sûriyê werin lidarxistin, derfetekî din a gavavêtina di xeta çareserî û pêşxistina demokrasiya civakî ya herêmê ye.

Tişta balkêş di xebatên amadekariya hilbijartinan de gelek kom û hevgirtinên siyasî dê bi yek lîsteyan bikevin hilbijartinan. Li aliyê din gelek namzetên serbixwe dê di pêşbirka hilbijartinan de bin. Ev derfeteke baş a ji nû ve avakirin û dîzayinkirina sîstema herêmê ye. Niha jî erk dikeve ser milê her kesî di vê qonaxa guhertin û veguhertinan di herêmê de bibin xwedî rol. Ev hilbijartin zemîneke din a têkbirina hemû planên dijberiya li ser herêmê ye. Ji ber wê jî dewletên dijber ku me li jorê jî behsa wan kiriye, wê rê nedin gelê herêmê wiha bi rehetî biçe hilbijartinan.

Dibe bi gelek rê û rêbazan hewil bidin hilbijartinên şaredariyan ku yekem derfeta gelê herêmê ye, bi encam bibe. Lewma serxistina hilbijartinan tê wateya têkbirina hemû planên dijberiyê ye. Di heman demê de serxistina sîstema Netewa Demokratîk a xwe dispêre piradîgma azadî û demokrasiya civakî.

Bi serxistina hilbijartinên şaredariyan û avakirina rêveberiyên hilbijartî dê di heman demê de mîna pêşxistina riya çareseriya hemû pirsgirêkên aborî, civakî û siyasî di herêmê de pêş bikeve. Lazime gelê me bi wê baweriyê di 11’ê hizêranê de berê xwe bide sendoqên hilbijartinan û xwedî li dengên xwe derkevin.

Piştî hilbijartinan jî erka gelê me ya hevşaredarên werin hilbijartin bişopînin, hesabê kar û berpirsyariyê ji wan bixwazin. Çawa hilbijêr dê bi dengê gelê me erk werbigirin, pêwîste gelê me di wê astê de be, rê nede tu kes mafê wan ji destê wan werbigirin.

Ji ber erka serke ya serxistina hilbijartinan ji komseriya bilind û saziyên rêveberiya xweser ên têkildarî zêdetir, civaka herêmê ye.



# ‘Bikaranîna çekên kîmyawî nîşana bêhêzbûna dagirkeriya Tirk e’

Lêkolîner Lezgîn Ibrahîm da zanîn ku bikaranîna dewleta Tirk ji çekên kîmyawî li hemberî Gerîlayên Azadiyê ji ber bêhêzbûna wê ye û got, “Dewleta Tirk a dagirker di şerê li dijî gerîlayên azadiyê de PDK’ê wekî amûrekî bikar tîne.”

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker di dema heyî de êrişeke berfireh li ser Qadên Berxwedanê dide meşandin û tevkariya PDK’ê di vî alî de eşkere ye. Ji hêleke din ve dewleta Tirk a faşist û hegemon ji bo pêkanîna armancên xwe yên dagirkeriyê li ser herêmê hevdîtinên xwe û hewldana xurtkirina têkiliyan bi dewletên cuda re pirtir kiriye. Têkldarî van mijarên ku me anîn ser ziman lêkolînerê Navenda Firat a Lêkolînan, Lezgîn Ibrahîm bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Dewleta Tirk di dema heyî de hewldanên xurtkirina têkiliyên xwe bi dewleta Îraqê û dewletên rojavayî re dike û li aliyekî din êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike, herwiha li Filestîn piştevaniya Hemasê dike, gelo dewleta Tirk çima siyaseteke wiha dimeşîne û çi sûdê ji vê tevlîheviya di herêmê de dibîne?**

Wekî ku em dibînin dewleta Tirk di vê dema dawî de liv, tevger û hewldana pêkanîna hevdîtinên xwe bi dewletên rojavayî û yên derdora xwe re zêde bike. Nexasim piştî şerê ku di navbera Hemas û Îsrayîlê de rû da. Dewleta Tirk dîse xwest balê bikşîne li ser xwe û xwe weke pêşengê muslmanan û doza filestînî bide nîşandan, me dît ku piştgiriya Hemasê kir. Lê di wî şerî de hikumeta AKP’ê rola wê kêm bû û hate paşguhkirin. Lê dewleta Tirk xwe wisa nehişt, divabû ku şerekî dijwar di herêmê de biafrîne, ew şer jî şerê li dijî kurdan û Tevgera Rizgariya Kurdistanê bû. Dagirkeriya Tirk di meha bûrî de li dijî Gerîlayan dest operazisiyonekê kir. Di heman demê Erdogan serdana hikumeta Îraqê û Başûrê Kurdistanê kir û armanca wê ya sereke ew bû ku dewleta Îraqê jî destekê bide wê ji bo meşandina şerê li dijî Qadên Berxwedanê. Artêşa Tirk a dagirker niha êrişan li ser çiyayên Kurdistanê dide meşandin, li aliyekî din jî gefê êrişên bejahî li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Erdogan berî demek nêz de xwest ku serdana Waşontonê bike lê Amerîka ev serdan taloq kir. Dewleta Tirk îroj di hudirê xwe de rastî kirîzeke mezin tê, ji ber lawaziya xwe jî, ew nikare pirsgirêkên hudirîn çareser bike. Lewma jî dixwaze liv û tevgera xwe zêde bike, herwiha tevlîheviyê di herêmê de bi riya afrandina şerên derveyî sînorê xwe bide meşandin. Bala gelê Tirkiyê û cîhanê bigiştî bikşîne li ser şer û rûdanên ku çêdike, hem jî kirîzên di hundirê Tirkiyê de binuxmîne.

**-Ev bû nêzî mehekê dagirkeriya Tirk êrişên hovane û tund li ser qadên berxwedanê dide meşandin, van rojên dawî jî çekên jehrî jî bikar tîne li dijî Gerîlayên Azadiyê, li hember vê yekê jî PDK bi dewleta Tirk re eşkere tevkariyê dike di şerê li dijî Gerîla, gelo çima dagirkeriya Tirk êrîşên wisa di vê dema heyî de dike?**

Piştî ku hikumeta AKP’ê di hilbijartinên şaredariyan de bi bin ket û kurdan roleke girîng di van hilbijartinan de lîst û gelek şaredariyên Bakurê Kurdistanê bi dest xist, êdî AKP’ê kete tengasiyekê. Êdî hat diyarkirin ku gelên Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê nema desthilatdariyeke wiha qebûl dikin, ji ber vê jî AKP’ê di nav gel de bêbandor ma. Nema dikarîbû bibe bersiv ji pirsgirêkên abûrî, deblomasî, civakî û hwd… yên hundirîn û derveyî. Êdî bi hinceta ku Tevgera Rizgariya Kurdistanê xeteriyê li ser ewlehiya Tirkiyê çêdike, êrişeke berfireh li ser gelê kurd û Gerîla da meşandin. Li aliyekî din xwest ku dewleta Îraqê jî ji bo şerê li dijî Qadên Berxwedanê bibe tevkar, lê li gor hat xuyakirin ev yek pêk nehat û armanca dewleta Tirk bi cih nebû. Partiyên kurdî yên Başûrê Kurdistanê, weke YNK’ê û yên din jî şerê li dijî Gerîla red kirin. Lewma PDK’ê ji bo dewleta Tirk bû amûra tekane di warê pêvajoya şerê li dijî Gerîla de û îro jî PDK’ê tevkariya dagirkeriya Tirk dike, PDK’ê jî ji bo xizmeta xwe vê yekê dike. Di rojên dawîn de weke ku we anî ser ziman, dewleta Tirk çekên jehrî di şerê li dijî Gerîlayên Azadiyê de bi awayekî hovane bi kar anî. Bikaranîna rêbazeke wiha nayê wateya ku artêşa Tirk û AKP’ê gelekî hêzdar e, lê belê nîşana qelsbûna dewleta Tirk a dagirker e.

**-PDK’ê çi sûdê ji van êrîşên ku dewleta Tirk a dagirker li dijî Gerîla dide meşandin, werdigire û ev yek çiqasî dikeve dijî xizmeta yekrêziya kurdî? Li aliyekî din heya ku xiyaneta PDK’ê bi dawî bibe û hevrêziya kurdî pêk were, çi ji gelê kurd û partiyên siyasî tê xwestin?**

Sûda ku PDK’ê ji hevkariya dewleta Tirk adagirker re werdigire, xurtkirina têkiliyên aborî û siyasî ye, ev yek jî dikeve xizmeta berjewendiyên PDK’ê. Em dizanin ku di van salên dawî de PDK û hikumeta Başûrê Kurdistanê di rewşeke aborî ya lawaz de derbas dibe. Herwiha PDK’ê têkildarî mijara danûstandên bi Bexdayê re astengiyan dibîne. Lewma jî PDK petrola Başûr bê erêkirina hikumeta Îraqî difroşe dewleta Tirk a dagirker û aboriya xwe bi vî awayî bihêztir dike. Li aliyê siyasî jî dema ku hilbijartin çêdibin, PDK’ê hêza xwe ji dewleta Tirk werdigre. Bi vî awayî jî PDK’ê berjewendiyên xwe di asta yekê de li ser berjewendiyên kurdayetiyê û yekîtiya kurdî dibîne. Di van salên dawîn de û bi taybet şerê li dijî DAIŞ’ê û têkçûna wê, êdî giraniyeke gelê kurd li ser asta cîhanê çêbû û hêzên kurdî çi li vir an li Başûr an jî li Bakurê Kurdistanê be bûne xwedî rolên ektîv di warê leşkerî û siyasî û hwd… Berî çend heftiyan Waşontonê şandeyeke YNK’ê vexwend û bi hev re civînek li dar xistin. Di wê civînê de jî rewşa kurdan û kurdistanê hate parvekirin. Waşontonê di wê demê de civîna bi Erdogan re taloq kir û pê re jî civînek bi YNK’ê re li darxist. Ji ber vê jî em dibînin ku giraniyeke kurdan û hêzên kurdî çêbûye. Lê tişta ku tê xwestin ew e ku kongreyeke netewî ya kurdî were lidarxistin û partiyên siyasî yekbûneke xwe ava bikin. Di heman demê de pêwîste gelê kurd û tevahiya partiyên me PDK’î hişyar bikin ji vê tevkariya ku bi dewleta Tirk re dike. Ji ber ku ev tevkarî dibe astengiyeke mezin li pêşiya yekîtiya kurdan û hevrêziya kurdî. Ger wiha nebe dê rewşa me kurd êdî wê nebaş be.



## Nermbûn tune ye, şer didome



**Zekî Bedran**

Fenên Erdogan ên nermbûnê rawestîna şer û Kurdan nagire nava xwe. Êrişên xwe yên li Sûriyê didomîne. Ji bo êrişên berfirehtir pêk bîne hewl dide erêkirinê ji Rûsya û DYE yê bigire. Heta ev hêz qada hewayî venekin, Tirkiye nikare êrişên hewayî yên berfireh pêk bîne. Ji ber ku parastina qada hewayî di destê van hêzan de ye. Êrişên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê jî her ku diçe berfirehtir dibin. Di bikaranîna çekên qedexekirî û kîmyewî de zêdebûnek tê dîtin.

Weke berdewamiya van êriş û amedekariyan, di doza kompoyê ya Kobanê de seza li rêveberên HDP’ê barandin. Navê dozê doza Kobanê bû. Rêveberên HDP’ê weke berpirsyarê kişkirina gel û qetilkirina bi dehan mirovan dîtin. Baxçelî û Erdogan her tim gelê Tirkiyê û raya giştî ya ji derve bi van mijaran xapandin. Lê tu rêveberên HDP’ê ji ber van dozan seza negirt. Xebatên wan ên di qada zagonî û daxuyaniyên wan kirin hêncet. Bi biryarên wan piştrast bû ku delîl tune ne, doz bi temamî tol û tesfiyeya siyasî ye.

Erdogan di hevdîtinên bi Ozgur Ozel re çêkirî de daxuyaniyên nermbûnê da. Nermbûn weke berdana fermandarên di girtîgehê de derket holê. Ev mirov jî bi armanca tol û perçiqandinê dihatin girtin. Temenê wan 80 derbas kiribûn. Bi berdana van, bi xapandinê nermbûn û asayîbûn çênabe. Ev nermbûna qaşoyî jî bandora xwe li Kurdan nekir. Bandorê jî nake, ji ber Kurd bi awayek rêkûpêk bi balefir û çekên giran tên bombebarankirin.

Hêzek zêdetir derbasî Başûrê Kurdistanê jî dikin. Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bênavber bi bejahî û hewayî tê bombebarankirin. Çete ji bo berfirehkirina dagirkerî û êrişan tên perwerdekirin. Hêzek zêdetir dikişîne herêmê. Bi milyonan dolar dimezêxin û herêmê dikin cihê jiyana xwe. Ma dema ev mezaxtina şer û amedekariyên dagirkeriyê didomin wê çawa nermbûn û asayîbûn pêk bê? Eger bikevin nava bendewariyek wiha, emê nikarin xwe ji amûrbûna şerê taybet xilas bikin.

Erdogan û Baxçelî dixwazin CHP’ê jî bixin nava şerê li dijî Kurdan. Ji ber ku hilbijartin winda kirin. Rewabûna wan derbeyek mezin xwar. Eger CHP’ê helwestek cidî nîşan bide û di demokratbûnê de bi israr be, nikarin bi hêsanî vî şerî bidomînin. Dixwazin CHP’ê jî bixin nava şer, ji xwe re bikin yedek û bi gelê Kurd re bînin beramberî hev. CHP ya ku beşdarî şer bibe û piştgiriya şer bike, piştgiriya Kurdan nagire. Di vê rewşê de jî wê pêşiya desthilatbûna CHP’ê bigirin. Erdogan, her ku li dijî Kurdan şer kir winda kir. Ji ber ku Kurd û pêşengên wan li ber xwe dan. Yên ku pêşeroja xwe di şer de dîtin û di şer de bi israr bûn winda kirin. Ji sala 2015’an ve AKP’ê şansê bi serê xwe bibe desthilat û hêza xwe winda kir. Niha jî bû partiya duyemîn.

Eger CHP’ê gavên ku AKP’ê rizgar bike û rihet bike biavêje jî wê Kurd li ber xwe bidin. Di encamê de ya ku winda bike û bawedariya xwe winda bike wê CHPM’ê be. CHP ya ku piştî 47 salan derfeta bûyîna partiya yekemîn bi dest xistiye, eger çareserkirina pirsgirêka Kurd û demokrasiyê armanc bike wê Erdogan tune bibe. Tu sedem an jî pêwîstiya ku li ser desthilatê bimîne wê nemîne. Desthilata AKP-MHP’ê çavkaniyên welat herikandin şer û alîgirên xwe. Hiqûq û dad qetil kirin. Ragihandin di destê desthilatê de ye, kirin amûra reşkirina rastiyan. Tu pirsgirêkên Tirkiyê yên ji derve û hindir çareser nebûn û her tişt xirabtir bû. Hejarî û alozî kûrtir bû.

Rêveberiya faşîst a AKP-MHP’ê, kiriye armanc ku tevahî Kurdan ji Rojava derbixe. Pêwîstî nabîne ku vê armanca xwe veşêre. Dibêje ku wê ji Efrînê heta Dêrikê herêmên ku Kurd lê dijîn bi kûrahiya 30 km dagir bike, plana xwe ya nîvî mayî temam bike. Weke ku li herêmê mirov nînin nîşanî raya cîhanê dike. Herêmên ser sînor ku Kurd lê dijîn weke “korîdora terorê” bi nav dike. Ji Kurd û Kurdistanê re dibêje “Terorîstan” û dibêje em nahêlin li vir “Terorîstan” bê avakirin. Dibêjin, “Em di vê mijarê de bi biryar in, kesî guhdar nakin, berdêla wê çi dibe bila bibe emê êriş bikin”.

Dema ku DAIŞ’ê Kobanê dorpêç kir û êriş kir, Erdogan mizgînî dida gelê Tirkiyê û digot, “Va Kobanê ket, li ber ketinê ye”. Tişta ku bû sedem gelê Bakurê Kurdistanê aciz bibe û dakeve kolanan, gotin û kiryarên Erdogan bûn. Eger yek di vê dozê de bê darizandin ne HDP’yî Erdogan bixwe ye.

Erdogan çima xwest Kurdan bi destê DAIŞ’ê tune bike? Cîhan dizane ku Erdogan bi DAIŞ’ê re hevkarî çêkiriye, di dijminahiya li dijî Kurdan de bûne hevkar. Lê ji ber ku yên êşyayî Kurd in, tucar vê ji bîr nakin, wê bersiva pêwîst bidin Erdogan û Baxçeliyê ku dixwazin qirkirina Kurdan temam bikin.

## ‘Doza’ tolgirtina berxwedana Kobanê



**Farûk Sakik**

Doza Kumpasê ya Kobanê bi encam bû. Doza Kumpasê ya Kobanê ku di 26’ê Nîsana 2021’ê bi rûniştina pêşî dest pê kir û hezar û 117 rojan dewam kir, 10 salan dom kir.

Çima navê “Doza Kobanê” lêkirin? Sedema xwe Serhildana Kobanê ya li Bakurê Kurdistanê ye, ku ji 5 heta 8’ê Cotmeha 2014’an dewam kir bû. Ji bo vê yekê em jî dibêjin, ev doz tolgirtina berxwedana Kobanê bû. Em ê ji Kobanê bi rê kevin û piştre vegerin dadgeha li Sîncanê.

Piştî ku DAIŞ bê midaxaleyekê Reqa û Mûsil dagir kirin, di serî de dewleta Tirk, berê van çeteyên hov dane Kobanê. Dema êrişên DAIŞ’ê dijwar bûn li Kobanê berxwedan li derve jî serhildan dest pê kir. Kurd li her deverên ku lê bûn tevlî têkoşîna Kobanê bûn.

Dewleta Tirk û DAIŞ li Kobanê têk çûbûn. Erdogan û hevalbendên wî dixwestin tola vê serkeftinê bigirin. Têkçûna DAIŞ’ê qebûl nedikirin, an jî hazim nedikirin.

Desthilata dewleta Tirk, piştî ku serhildana gel bi ser ket, di cih de ferman ji dozgerên xwe re şand û heman salê ango 2014’an lêpirsîn da destpêkirin. Piştre doza tolhildana serkeftina Kobanê li dadgehên Sîncanê dan destpêkirin. Li salonên dadgehan kesên dihatin darizandin tu car xwe wek bersûc nedîtin. Neketin pozîsyona parastinê jî. Wan li dadgehê ev sîstema faşîst darizandin. Lê di van 10 salan de ji bilî tolhildanên hin hemleyên din jî çêbûn. Ev doz wek çekek siyasî jî bi kar anîn. Mînak di hilbijartinên xwecihî yên sala 2019’an de bi teklîfa ku piştgirî nedin Îmamoglu wê doza Kobanê bidin seknandin kirin. Bi vê yekê îtîraf dikirin ku doz, siyasî ye, ya tolgirtinê ye, ev neyartî ye û daxwaza bidawîanîna siyaseta demokratîk e.

Di encama dozê de, hin kes serbest hatin berdan û li hin kesan jî cezayê giran hat birîn. Bi encamên dozê, rejîma faşîst careke din îtîraf kir ku doz, dozeke siyasî ye.

Çima?

Di medya dîjîtal de em rastî nirxandinekê hatin. Biryara dadgehê wiha îzah dikir; “Heger tu teslîm bibî wek Ayhan Bîlgen û Altan Tan tu yê beraet bikî. Heger tu hafizaya xwe wenda bikî, wek Aysel Tugluk tu yê serbest bê berdan. Heger tu Tirk bî û piştgirî bidî doza Kurdistan wek Fîgen Yuksekdag tu yê 30 sal ceza bigirî. Heger tu wek Selahattîn Demîrtaş lîderekê ku ji aliyê civakê ve werî hezkirin û li ber wan çok daneynî tu yê 42 sal ceza bigirî.”

Em bi hevoka ku ‘dema ku tu çok daneynî’ dewam bikin. Ji Şêx Seîd, Seyîd Riza û gelek pêşengên doza Kurdistan li ber dijmin tu carî çok daneynan û hatin qetilkirin. Îroj dîrok li wê salona dadgehê xwe dubare kir. Ha wê were gotin, hin kesan çima beraet kirin. Bi beraet hin siyasetmedaran xwestin peyama ku ev doz siyasî nîne bidin. Bibêjin, a ha ku siyasî bûya, me çima wan kesan berdan. Lê civak û herkes êdî dizane ku ev doz doza tolgirtinê ye. Bendewariyê tu kesî tunebû ku ji wê dadgehê edalet û hiqûq derkeve.

Di van 10 salan de dadgehek din ya ku DAIŞ dihat darizandin jî hebû. Hêzên navnetewî di vê darizandinê de rol û mîsyona xwe nelîstin. An jî pêk neanin. Meydan dîsa ji Erdogan re ma. Me li jor behs kiribû ku teklîfek bêexlaqî ya di demê hilbijartinan de kiribûn. Erdogan darizandina DAIŞ’ê jî wek bazariyekê da pêş Kurdan.

Lê di çanda Kurdan de tiştek heye, tu carî bersiv nadin teklîfên bêexlaqî. Di vê doza tolgirtinê de jî tu carî tawîz nedan. Dîrok wê wan kesên di vê dozê de hatin darizandin mafdar bibîne û zîhniyeta dijminatiya Kurdan jî mehkûm bike.